



Ajotina bisiklêtan li Almanyayê –
Giringtirîn rêgez

KURMANCI



Hûn bi xêr û xweşî hatine Almanyayê!

Ajotina bisiklêtan li Almanyayê cihê hez-
kirinê ye.

Ji bo ku hûn bi rehetî û bi ewlehî bisiklê-
tan di nav kolanên Almanyayê de biajon,
me ji bo we kurtebroşûrek amade kiriye.

Naverok

Ajotina bisiklêtan ya biewlehî	6-7
Rêgezên trafikê yên giştî	8-9
Rêya ji bo bisiklêtan	10-13
Reftara rast li cem filkeyê	14-15
Metirsiyên taybet	16-17
Hûn li pedelekê siwar dibin.	18-19
Agahdariyên zêdetir û materyalên zêdetir	20

KURMANCI





Hûn bisiklêtê diajon



Wekî prensîb, heman rêgezên trafikê yên ku ji bo bisiklêtann çêdibin, **ew bi xwe mîna yên ku ji bo ajotina tîrîmbêlan çêdibin.**

(Rêgezên mafê ajotinê, kolanên yekber, Lempeyên trafikê...)

Ajotina bisiklêtê ya biewlehî

Bisiklêt divê ku çira, frên û zengilê wê hebe.

Çêdibe tenê mirovek li bisiklêtê siwar bibe.





Rêgezên trafikê yên giştî



TEVGERA ÇÛNÛHATINÊ YA DESTÊ RASTÊ

Li Elmanyayê, ajotin bi gelemperî li aliyê destê rastê bi rê ve diçe. Ji ber evê yekê, ajotin li rexê rêyê yê rastê ye. Li mesafeya di navbera xwe û tîrmbêlên sekinandî de miqate be. Metirsiya deriyê tîrmbêlê yê vekirî heye ku ew derî li we bikeve. Pêşderbasbûna siwaryên din her dem ji aliyê çepê ve ye, ta li Ser rêyên bisiklêtan jî.



Pêşderbasbûn ya rêya aliyê rastê



Nîşanên mafê pêşderbasbûnê

Li cem evan armyên trafikê, divê ku hûn rê bidin siwaryên din û li benda wan bisekinin.

Raweste!

Pêşderbasbûn ya rêya aliyê rastê ye.



RÊBAZA PÊŞÎN „RASTÊ BERÎ ÇEPÊ“

Li cem filkeyê, rêgeza rastê berî çepê li dar e, ji bilî dema ku lampeyên trafikê yan armyên trafikê hebin û tişteki din nîşan didin. Ev tê wê wateya ku kesên ji aliyê rastê ve tîrmbêlên ajotinê bi wan re ye.

Filke û xaçerêkên ku naskirina wan zehmet e, bi awayên taybet tîrmbêlên nîşankirin û rêgeza „rastê berî çepê“ li vir jî li dar e.

Mafê
pêşderbasbûnê



Kolana
pêşderbasbûnê



Li cem evan armeyên trafikê,
divê ku ajokarên bisiklêtên din
rêyê bidin we.

RÊGEZÊN JI BO RÊWIYAN:

- Tenê kesek çêdibe ku li bisiklêtê siwar bibe.
- Her du destên xwe deyin ser destikên (derkîsionên) bisiklêtê.
- Ger gengaz be, yek li dû yê din biajo.
- Her dem kumê bisiklêtê li xwe bikin. Ew dikare serê we ji birînên giran biparêze.
- Çênabe ku ajokarên bisiklêtan xwe nêzîkî siwareyên din bikin.
- Divê ku rêgezên ajotinê di ber çavan re bêne derbaskirin. Bisiklêt ji ji hêla polîsan ve têne sekinandin û cezayên pereyan li wan têne xistin.
- Di dema ajotina bisiklêtê de nabe ku hûn telefonê bikin, her weha çênabe ku hûn li smartfona xwe binerin.
- Piştî vexwarina alkolê, çênabe ku hûn bisiklêtê biajon.
- Her dem di derbasbûn û derketina derbasgehan de, bila hûn amade bin ji bo frêngirtinê.
- Baldarî Xafilbûna kamyonan li ser we hêsan e, ji ber vê yekê her gav li pişt kamyonan bisekinin, biajon û rawestin.
- Zarokên piçûk tenê dikarin li kursiyên zarokan an ji li erbeyên taybetî, yê ku bi dawiya bisiklêtan ve tîr girêdan, siwar bibin





Rêyên ji bo bisiklêtan



Bisiklêt siwareyek e û ji ber vê yekê ew li rêvê vrdigere. Divê ku zarok heta 8 saliyên ji rojbûna xwe. Li ser peyarêyê bîajon. Divê ku zarok heta 8 saliyên ji rojbûna xwe, hîn jî peyarêyê bi kar binin.

Ji bo hemû kesên din ajotina li ser peyarêyê qedexe ye; ev yek jî bo dêûbavên ku bi zarokên xwe re ne jî.

Rêya bisiklêtan û rêya tirimbêlan bi resîfan jî hevûdin têne cudakirin, her wiha rêya meşê jî bi nîşan û armeyên cuda jî wan têne veqetandin.

Rêya bisiklêtan/
Derbasgehên bisiklêtan

Rêyên bisiklêtan li ser rêyên bi xêzeke spî ya sade û xêzeke şîn jî bo bisiklêtan hatine nîşankirin. Destûra ajotinê jî bo siwareyên bimotor nayê dayin.





Xala parastinê li ser kolanê bi xêzeke şikestî û wêneyê bisiklêtekê hatiye nîşankirin. Siwaryên bi motor tenê dikarin li ser wê bajaran, heger ku neçar bin ku rê bidin siwaryên ku tên.

Di heman demê de rêyên meş û bisikletan **yên hevpar jî hene**. Ajokarên bisikletan divê li ser rêya bisikletan bajaran (rêya tirimbêlan qedexe ye). Divê hûn rêyê bi peyayan re parve bikin.

Ji ber evê yekê: Haya we ji peyayan hebe û ger hewce be, li zengilê bixin, da ku hûn ji wan derbas bibin.



Rêya meşê ya hevpar
û rêya bisikletan



Rêya bisiklêtan



Rêya meşê ya hevpar
û rêya bisiklêtan



Rêya bisiklêtan ya li
teniştê rêya peyayan

AJOKARÊN BISIKLÊTAN DIVÊ LI VIR BIAJON:

Dem a ku li ser rêya bisiklêtan, bisiklêtekî sipî û dawîya wî şîn hatibe xêzkirin, divê ku hûn wê bikar binîn ku tu astengî tune bin. Di pişt re hûn dikarin li ser kolanê bi hişiyarbûn xwe jê derbas bikin. Ne gengaz be ku bi ewlehî xwe veguhezînin kolana din, divê hûn ji bisiklêta xwe dakevin û xwe ji astengiyê dûr bixin û bi meşê derbas bibin.

Dibe ku rêyên bisiklêtan yê bêyî nîşanan bêne bikaranîn, lê ne hewce ne ku bêne bikaranîn. Li vir jî, li ser evê rêyê hûn dikarin bijon.

LI VIR AJOKARÊN BISIKLÊTAN DESTÛR BI WAN RE HEYE KU BIAJON:

Deverên din çênabe ku bêne bikaranîn (mînak peyarêk, qadên peyayan) ji bilî tenê heke ku bi nîşana „Serbest e ji bo bisikletan“ an „bisiklêt di her du alîyan re“ hatibe nîşankirin, wê demê dikarin bêne bikaranîn.





Rêyên bisiklêtan ên bilez, rê didin bisiklêtan û peywendiyên rasterast bi wan re bikin û rêjeya herikîna bilind e.



Wekî prensîb, li deverên bisiklêtan ji bilî siwaryên piçûk ên elektrîkî, siwaryên din destûr bi wan re tune ye.



Kolanên ku ev arme bi wan re daliqandîne, destûr bi we re tune ye ku hûn derbas bibênê.



Bêyî armeya „serbest e ji bo bisiklêtvanan“ divê hûn ji bisikleta xwe dakevin û bi meşê derbas bibin.

BISIKLÊTVAN LI VIR NIKARIN BIAJON:

Şahrê



Otoban



Peyarê



Qedexa ye ji bo hemû siwaryan.



Qedexa ye ji bo çûnûhatina bisiklêtan.






Reftara rast li ser filkeyan



LAMPE

Di heman demê de dema hûn bisiklêtan diajon, divê hûn bala xwe bidin lampeyên trafikê.

Herger lampeyên trafikê yên taybet bi bisikletê hebin, divê hûn guh bidin wan. Carinan ji bo bisiklêtvanan û peyayan lampeyên trafikê yên hempaer jî hene.



Ger lampe kesk be, hûn dikarin biajon. Lê hişiyar bin.

Ger lampe zer be, hûn nema dikarin siwareyê biajon. Rawestin.

Bisekinin! **Ger lampe sor be,** divê hûn her dem sekinî bimînin.

Carinan, wek nîmûne dema ku lampeyên trafikê vedimirin, asayiş çûnûhatinê bi rê dibin. **Nîşaneyên destên asayîşê her gav ewlewiya wan e.**

Her du dest li jêr:

Hûn dikarin niha biajon. Lê hişiyar bimînin.

Destek li jor, yê din li jêr:

Hişiyar! Li benda nîşana din bisekinin, berî ku derbas bibin.

Destên xwe bi aliyên rast û çepê ve dirêj kirine.

Bisekine!



HIŞIYA BIN, DEMA KU HÛN DIZÎVIRÎNIN

Bi vî rengî hûn bi ewlehî difitilînin:

1. Lisermilnerîn:

Pêşîn, li ser milê xwe binêrin û li çûnhatina tirimbêlan temaşe bikin.

2. Nişanên destan bidin.

Bi destên xwe xweşik diyar bikin, ba ka hûn dixwazin bi kîjan aliyê ve bizivirin.

3. Rêzkirin:

Ger rêgezin bisiklêtan hebe, wan bişopînin.

Biriyara xwe bistînin û di pişt re derbasbî derbasgeha rast bibin.

4. Zivirandin

Dema ku hûn li ser destê rastê bizivirin, di heman demê de ku peyarên rêyê

derbas dikin, haya we ji wan hebe, mafê pêşderbasbûnê wê wan e. Dema ku hûn li ser destê çepê bizivirin, divê hûn her gav rê bidin siwaryên ku tên, mafê pêşderbasbûnê wê wan e. Ger armeyên taybet ji bo bisiklêtvana hebin, wan bişopînin.

5. Tîra kesk ji bo bisiklêtan e.

Li cem lampeyên trafîkê yê tîra kesk ên ji bo bisiklêtvana, çêdibe ku li ser destê rastê bizivirin piştî rawestandîne, tevî ku lampeya sor vêketî be jî.



ZÎVIRANDINA NEYEKSER

Gava hûn li ser cadeyê bin û dixwazin li ser destê çepê bizivirin, lê hûn xwe neewle dest dikin, hûn dikarin zivirandina li ser destê çepê ya neyekser pêk bînin.

1. Di pişt re rast biajon û di ser çererêyê re derbas bibin.
2. Li milê rastê yê rêyê rawestin, dibe ku hûn neçar bibin ku hûn dakevin.
3. Bisekinin heta ku rê vala bibe.

Paşê kolanê derbas bikin û berdewam biajon.



Metirsiyên taybet



„XALA KOR“

Bisiklêtvan di metirsiyê de ne, bi taybetî dema ku kamyon an otomobil ser destê rastê dizivirin. Li cihê xala kor, ajokarên kamyonan we xweşik nabîne yan jî we qet nabîne.

Bila ajotina we bi bergirî be. Ger hûn dudil bin, dev ji mafê xwe yê pêşderbasbûnê berdein an dakevin û berê xwe bidin peyarêyê. Di evê rewşê de divê hûn jî bisiklêta xwe dakevin û bi destên xwe bimeşînin.

DERBASGEHÊN KERKOVÎ

Dema ku mirovên peya kolanê derbas dikin, mafê pêşderbasbûnê yê peyarêyan e. Ew dikarin kolanê derbas bikin, hemî siwara û bisiklêt divê li benda wan bisekinin.

Li vir yên ku evan yasayan di ser guhên xwe re biavêjin, ceza li wan tê birrîn.



JI BER VÊ YEKÊ

- Her dem bidûr û li pişt kamyonan/ otobusan rawestin; qet li kêlek, berî, yan yekser li pişt wan nesekinin.
- Kamyonek/otobusek pêdiviya wê bi gelek cih heye. Mesafeyeka vala bihêlin.
- Bi hişiyarî biajon. Heke gumana we hebe, dev ji mafê xwe yê pêşderbasbûnê berdin. Qezayên bisikletan bi kamyonan an otobusan re bi gelemperî bi mirinê bi dawî dibin.
- Tirimbêlan ji aliyê rastê ve derbas bikin, tenê ger ku derft hebe.
- Têkiliya dîtbarî bi ajokerê din re bikin.





METIRSIYÊN DIN

Bi baldañi bïajon û bi **taybetî li ser rêyên peyarê û bisiklêtan yên hevpar û ne gelekî bi lez û bez** bïajon, da ku her gav hûn bikarin firênê bigirin û rawestînin. Leza ajotina xwe li gor leza peyayan eyar bikin.

Her weha dibe ku hûn ji hêla ajokarên tirimbêlan ve li cem derbasgehên malan neyên dîtin.

Dûra dî navbera xwe û siwaryên din biparêze, dibe ku derî ji nişka ve vebin.



DEMA KU BÛYEREK RÛ BIDE

Ger bûyerek bi we re rû bide, xwe li cem beşa alîkariyê tomar bikin, da ku bêne alîkariya we. Bêyî ku hûn bûyerê tomar nekin, qet ji cihê bûyerê nemeşin. Wê bê cezakirin.

Telefona hejmara Navenda Rizgariyê bikin: 112
Ev hejmara têlefônê kar dike, bêyî ku resîd jî tê de hebe.

Navenda koordînasiyona rizgarkirinê dê evan pirsyaran bike:

Li ku derê tişteke çêbû?

Çi çêbûye?

Çend mirov bandor li wan hetiyê?

Kîjan cureyên birînan hene û çi pêdivî hene?

Li benda pirsên din bin bisekinin!

Li benda ambulansê yan jî polîsan bisekinin û agahiyan bidin wan.

Heke hûn bi xwe nikarin telefona wan bikin, ji kesên din re rewşa bibêjin, da ku ew bikarin alîkariyê bikin.



Hûn pedekekê diajon



Ger hûn li pedekekê biajon, ji kerema xwe hişyar bin ku we berê perwerdeya wê kiriye.

Ji ber ku bisiklêtên kehrebeyî heta 25 km/h bi piştgirîya elektrîkê dimeşin û piştgirîya hêza wê dike, hûn carinan dikarin pir bilez bin.

Bertekên wan ji yên bisiklêtên normal cuda ne.



Bi bisiklêtên kehebeşî hûn dikarin û divê ku hûn li ser rêya bisiklêtan bîjin.

Heman rêgezên ku li ser bisiklêtan din têne bicîhkirin. Destûr bi we re tune ye ku hûn peyarêkê bikar bînin. Hûn dikarin rêçikên bisiklêtan bikar bînin.

Pêdiviya we bi sigortayê tune ye ji bo ajotina pedalekê, yan jî temenekî destnîşankirî.

Lê belê, em bi her dem pêşniyar dikin ku kumekî li xwe bikin.





Agahiyên zêdetir:



www.germanroadsafety.de

Her weha hûn dikarin broşûrên bi versiyonên zimanên din jî ji evê malperê bêpere daxin.



Hate weşandin ji hêla:

Deutscher Verkehrssicherheitsrat (DVR)
Jägerstr. 67-69
10117 Berlin
www.dvr.de

Deutsche Verkehrswacht e.V.
Budapester Straße 31
10787 Berlin
www.deutsche-verkehrswacht.de

Unfallforschung der Versicherer (UDV)
Wilhelmstraße 43/43 G
10117 Berlin
www.udv.de, www.gdv.de

Redaksiyon:

Olivera Scheibner (DVR), Kay Schulte (DVR),
Daniel Schüle (DWW), Jörg Ortlepp (UDV)

Têgeh, layout, nivîs:

P.AD. Werbeagentur, Meinerzhagen
2022

Belgeya wêneyê:

www.dvr.de
www.shutterstock.de